Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1256 | 16-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Bi çêkirina zembîlan afrîneriya xwe bi pêş dixe



Hediyê El Ehmed yek ji jinên ku girîngî didin pêşxistina xebatên jinan e. Ew zembîlan çêdike. Çîroka serkeftina wê ne tenê bi karê takekesî re sînordar e, ew bi çîrokên jinên din ên ku bi wê re hevkariyê dikin, ji bo jinên bi hêz û afrîner karê xwe dike.

**'Min hûrguliyên çêkirina wê meraq dikir'**

Hediyê ya tevî astengî û zehmetiyan hewl dide destkeftiyan bi dest bixe wiha dibêje: "Ev 7 sal in di karê çêkirina zembîlan de dixebitim. Di vê demê de bûm xwedî gelek tecrubeyan. Hinek ji wan zor bûn, hin jî kêfxweşî û destkeftî bûn. Ez bi karê xwe serbilind im. Bi vê yekê ez pîşeyên xwe derdixim holê û xwe bi pêş dixim. Di heman demê de di warê aborî de destek didim malbata xwe. Piştî ku min dît komek jin zembîlan çêdikin, hezkirina min ji vî karî re zêde bû. Min hûrgiliyên çêkirina wan dişopand û meraq dikir ka çawa çêdibin. Min amûrên pêwîst weke qumaş, derzî û selik ji sûkê anîn û dest bi kar kir. Ev gava min a destpêkê bû, di çêkirina hunera destan de."

**'Xebatên komî bandorek erênî li ser hilberîna berheman dike'**

Hediyê qala hûrgiliyên di projeya xwe ya biçûk de kir û wiha got: "Destpêkê min di malê de kar dikir, keça min destek dida min û em bi hev re di vê projeyê de dixebitîn, me bi hev re kêliyên bi kêfxweşî û bi hezkirin derbas dikir. Ev jî kar xweştir dikir. Me rojê pênc heya heft s zembîl çêdikirin, her yek ji wan xwedî têkiliyek bêhempa bû ku afrîneriya me nîşan dida. Piştre bi jinên taxê re me dikanek biçûk vekir û tê de zembîl çêdikirin. Me demên xweş bi hev re derbas dikir. Ev xebata komê bi hev re têkiliyek taybet li projeya me zêde kir û bandorek erênî li ser hilberînên me kir."

**'Bi hevgirtina jinan projeya me mezin bû'**


Der barê pêşxistina kar û xurtkirina têkiliyên jinan ên di nava civakê de Hediyê El Ehmed ev tişt gotin: "Bi riya hevkariya di navbera jinên taxê de me derfet dît ku têkiliyên civakî di navbera jinan de xurtir bikin. Dikan ji me re bû cihekî ku em tê de afrîneriyên xwe bi pêş bixin û projeya xwe berfirehtir bikin. Ev kombûn mîna çavdêriya piştevaniyê ji me re bû. Hevgirtina me hişt em di karê xwe de berdewam bikin û destkeftiyên mezintir bi dest bixin. Ev pîşe xwedî tecrubeyên gelek baş bû, tijî destkeftî bû. Bi demê re daxwaz li ser hilberînên me yên ji aliyê civak û xwediyên dikanan ve mezin bû. Ev jî di encama dayîna kedeke mezin de bû."

**'Xwedî li pîşe û xeyalên xwe derkevin'**

Hediyê El Ehmed bi demê re pîşeya xwe bi pêş xist û projeya xwe berfirehtir kir. Hediyê behsa berfirehkirina projeya xwe kir û bi vê peyama ji bo jinan dawî li gotinên xwe anî: "Bi demê re ez hizirîm ku projeya xwe berfirehtir bikim. Bi taybetî piştî zêdebûna daxwazên berhemên min. Min hewl da rengên cuda li çêkirina zembîlan zêde bikim. Ji ber vê yekê min serî li komxebat û perwerdeyan da ji bo ku jêhatîbûna xwe di vê qadê de bi pêş bixim. Vê perwerdeyê rengekî cuda da çêkirina berhemên destan. Peyama min ji jinan re ew e ku xwedî li pîşeyên xwe derkevin û xeyalên xwe pêk bînin û nehêlin paşverûtiyên civakê bibin bend li pêşiya karê wan. Jinên xwedî îrade û hêz dikarin hemû bendan bişkînin." **NÛ JINHA**

# Pirtûka 'Vejîna li welatê rojê-Amara' bi Kurdî hate wergerandin

**Navenda Nûçeyan**



Romana ji sê bergan a nivîskar Mehmet Sait Uçlu ku 29'ê Adara 2021'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji ber nexweşiyê jiyana xwe ji dest da, bi navê 'Vejîna li welatê rojê -Amara' bi Kurdî hate wergerandin.

Têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd zêdeyî sed sal in dewam dike. Ev têkoşîn rêwîtiyeke ji zor û zehmetiyan e. Di vê rêwîtiyê de têk jî çû, bi ser jî ket. Lê belê li gel her cûre zehmetiyan jî ev têkoşîn mîna Dîcle û Firatê her tim ber bi deryaya azadiyê ve herikî. Ev dîrok, ev têkoşîn di vê serdemê de bi qasî ku hêjayî wê be nebû mijara wêje û hunerê. Rêber Apo girîngiyeke mezin da karê nivîsandinê. Ji ber ku nivîsandin hişekî, hişmendiyekê diafirîne. Ev hişê me hemûyan e. PKK di dîroka gelê me de xwedî cihekî taybet e. Tevgera ku Rêber Apo di Newroza 1973'an de da destpêkirin, li welêt pêşengî ji bûyîneke nû re kir. PKK ji bo gelê qedîm ê Mezopotamyayê bû navê jiyana nû. PKK veguherî sembola berxwedan û lehengiyê. PKK'ê di rêya azadiyê de xwedî li mîrateya jin û mêr ên leheng ên dîrokê derket û di vê oxirê de fedakarî kir.

Ev têkoşîn romana destaneke ji bo eşq, heqîqet û azadiyê ye. Vejîna li welatê rojê-Amara gava destpêkê ya vê destanê ye ku ji aliyê Mehmet Saît Uçlu ve bi ked û hesasiyeteke mezin hate amadekirin. Uçlu cihê ku di pirtûkê de qala wan tê kirin gav bi gav geriya, ew atmosfer li cih hîs kir, lêkolîn kir û ev kar bi feraseta wêjeyê şoreşgerî destnîşan kir. Destpêka vê destanê bi pirtûka destpêkê û 3 bergan amade kir. Vejîna li welatê rojê-Amara romanek xeyalî ya nivîskarekî nîne. Ev yek jiyana me ye, çîroka gelê me ye. Ev yek mizgîniya vejîna nû ye. Ev roman romana PKK'ê û têkoşîna Rêber Apo ye. Ev destpêkeke. Di her beşa vê berhema ji sê bergan de em ê şahidiyê ji destpêka vê destanê re bikin.

**Pirtûk balê dikişîne ser dîrok û berxwedana 200 salên dawî ya gelan**

Ev destan demekê ji tarîtiya dîrokê ronî dike. Ev berhema ji sê bergan pêk tê, balê dikişîne ser têkoşîna mayinê, berxwedan û dîroka du sed salên dawî ya gelan. Vê yekê jî bi rêya malbatekê dike. Di nava şerê bêdawî û hilweşîna demdirêj de qala têkoşîna jinûve avakirina jiyanê ya vê malbatê dike. Nivîskar bûyer û çîrokên zor û zehmetiyê yên li nava jiyana gund a mirovan mîna xelekekê digihîne hev. Her wiha qala bûyerên mezin ên raperînan dike ku di paşerojê de tevahiya dîrokê serûbin bikin. Mehmet Saît Uçlu bi sebir çîrokên trajîk ên van mirovan vediguherîne çîrokeke hêviya mirovahiyê.

Fermo, bi piştgiriya Weşanên Meyman em bi hev re ber bi paşerojê û heqîqetê ve gavê biavêjin. Bi zimanê xwe yê dayikê bi Kurdî em vê heqîqetê bixwînin. Vejîna li welatê rojê-Amara ku pirtûka destpêkê ya vê destana ji sê bergan e, li hemû Navendên Civaka Kurd a Demokratîk ên li Ewropayê, standên festîval û çalakiyan, her wiha li ser malperên meyman.org û pirtukxane.net dikare bê peydakirin.

**Sudoku: Bersiv 31**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 9 | 7 | 6 | 4 |
| 9 | 3 | 7 | 6 | 8 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 1 | 6 | 4 | 7 | 5 | 2 | 3 | 8 | 9 |
| 7 | 5 | 3 | 4 | 2 | 6 | 1 | 9 | 8 |
| 2 | 4 | 9 | 8 | 1 | 3 | 5 | 7 | 6 |
| 6 | 1 | 8 | 9 | 7 | 5 | 4 | 3 | 2 |
| 4 | 7 | 1 | 5 | 6 | 8 | 9 | 2 | 3 |
| 3 | 9 | 6 | 2 | 4 | 7 | 8 | 1 | 5 |
| 5 | 8 | 2 | 3 | 9 | 1 | 6 | 4 | 7 |

**Sudoku:Pirs 32**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 5 | 4 | | 9 | 1 | |
| | | | 2 | | 1 | 4 | | |
| | 1 | | 3 | | | | 8 | |
| 1 | 7 | | | 6 | | | 2 | 3 |
| | | | | | | | | |
| 4 | 2 | | | 1 | | | 7 | 9 |
| | 8 | | | | 4 | | 9 | |
| | | 2 | 9 | | 5 | | | |
| | 4 | 3 | | 2 | 7 | | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Me Cizir ava kir, Heso ser de zava kir:**
- Me du tişt bi destê xwe xistin.

**Ne ji kerê ne ji Perê:**
- Naxwaze ji her duyan jî bibe; dixwaze her duyan jî bi dest bixe.

**Pê re çiqiya:**
- Qezenceke mezin bi destê xwe xist.

**Seyda xwe nake ji her du eyda:**
- Dixwaze her duyan jî bi dest bixe.

**Sê da pey sê nan ji pisîkê re ma:**
- Dema hin ji nakokiya di navbera hina de dibînin hingê tê gotin.

**Toya wê ew dixwe:**
- Tişta herî baş para wî ye; para herî zêde ew hiltîne.

**Yek xwest bû cot:**
- Ji bo wî baştir bû.
(Dema yek ji tişta ku dixwaze pirtir dikeve destê wî wisa dibêje)

LI SER ŞER Û BIHEVÇÛNÊ

**Avêtin ser:**
- Ji bo kuştinê, yan ji bo talanê bi ser wan de girtin.
*Leşkerên dewletê avêtin ser gundê me.

**Ber hev ve zirav û dirêj bûn:**
- Şerê di navbera wan de dirêj bû; pir li hev xistin.

**Emê seriyekî li hev bidin:**
- Emê şer bikin; emê li hemberî hev têkoşîneke hişk bikin.

**Emê singên xwe li hev bidin:**
- Di şer de emê hev bibînin.

**Kerxek ji hev rakirin:**
- Pir ji hev kuştin.
(Kerx: Deviya mezin û fireh)

**Kopal wergerand kefikê:**
- Ji bo şer xwe amade kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Baas hilweşiya lê zihniyeta desthilatdariyê neguherî



Di 15`ê Adara 2011`an de gelên Sûriyê ji bo azadî û demokrasiyê li dijî rêjîma Baas serî hildan. Lê ji ber destwerdana hêzên derve serhildana gel veguherî şerê navxweyî û beşek berfireh ji xaka Sûriyê hat dagirkirin. **R-6**

# Komkujiya Helebce; xaleke reş li ser eniya mirovahiyê ye



Beriya 37 salan, dijminên gelê kurd bi çekên kîmiyayî li pêş çavê cihanî li bajarê Helebce yê Başûrê Kurdistanê 5 hezar kes qetil kirin. Li hemberî vê komkujiyê weke her car cîhan bêdeng ma.**R-5**

# Perwîn Yûsif: Banga aştiyê banga sedsalê ye



Hevseroka PYD'ê Perwîn Yûsif diyar kir ku Rêber Apo beriya vê banga dîrokî 13 carên din banga aştiyê kiriye, lê cûdabûna vê bangê ew e ku dewleta Tirk gihişte wê encamê ku ew nikare gelê kurd vegerîne derveyî rûpelên dîrokê û bi şer ew naghê armancên xwe.**R-2**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1256 | 16-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# DAXWAZA GELÊN HERÊMÊ; NETEWA DEMOKRATÎK E

Li Rojhilata Navîn her ku diçe rewş aloztir dibe, pirsgirêkên heyî kûrtir dibin û bê çareserî dimînin. Gelên herêmê jî ji ber vê yekê aloziyên mezin jiyan dikin. Di dema niha de hêzên hegemon ji bo parastina berjewendiyên xwe dixwazin herêmê ji nû ve dîzayin bikin. Li hemberî wê jî Rêberê Gelan Abdullah Ocalan ji bo çareseriyeke mayinde Banga Dîrokî kir. Banga wî ya Aştî û Demokrasiyê, li ser bingeha pirojeya Netewa Demokratîk dikare bibe dermanê birînên gelan.**R-3**




# Beha Şêxo; xwediyê deng û awazên resen



Hunermend Beha Şêxo diyar kir ku ji biçûkaniya xwe ve ew hogirê mûzîkê bû, ji ber ku kesayetek wek Mihemed Şêxo di mala wan de bû. Di heman demê de bavê wî jî stran digotin ev yek bandor li hestên wî yên hunerî jî kir.**R-7**



**Li Sûriyê Kopyakî Tirkiyê Tê Avakirin!**

Idrîs Henan R-5

# Divê zimanê çapemeniya Tirkiyê li gorî pêvajoya Aşitî û Demokrasiyê be



Rojnamevan Mansur Adali da zanîn ku çapemenî û tavahî Tirkiyê divê li hember pêvajoya Aştî û Demokrasiyê zimanê xwe bidin guhartin û got: "Ger Tirkiyê di vê pêvajoyê de xwe nede guhartin, wê windahiyên mezin jiyan bike".**R-4**

# Perwîn Yûsif: Banga aştiyê banga sedsalê ye

Hevseroka PYD'ê Perwîn Yûsif diyar kir ku Rêber Apo beriya vê banga dîrokî 13 carên din banga aştiyê kiriye, lê cûdabûna vê bangê ew e ku dewleta Tirk gihişte wê encamê ku ew nikare gelê kurd vegerîne derveyî rûpelên dîrokê û bi şer ew naghê armancên xwe.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê banga dîrokî ya ku di 27'ê Sibatê de ji aliyê Rêber Apo ve hatiye kirin, hevseroka Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Perwîn Yûsif bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**1- Banga Rêber Apo ya dîrokî ji bo gelê Rojhilata Navîn bi taybetî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bangekî çawa hate dîtin?**

Di serî de em vê banga Rêber Apo ya dîrokî pîroz dibînin, ji ber ku di Rojhilata Navîn de şer û pevçûn li her derê tê meşandin. Êdî zimanê çareseriyê bûye çek, komkujiya gelan, tunekirin, guhertin û veguhertina nexşeyan. Dema ku em vê qonaxê dibînin ku ewqasî asta şidetê bilind bûye. Li kêlekî wê bengewaziya ji bo aştî û demokratiyê ji bo gelan, gavekî gelekî pîroz e û dikarin jêre bêjin gavekî sedsalê ya tunekirina qonaxa şer, pevçûn û tunekirina inkarê li ser gelê kurd. Bi taybetî jî li Bakurê Kurdisatnê dewleta Tirk bi sedsala li ser gelê kurd komkujiyên mezin dane meşandin. Lewra dema ku Tevgera Azadiyê û Partiya Karkerên Kurdistan PKK'ê rahişte çekê ew ji bo maf û hebûn gelê kurd bû, ji bo ku gelê kurd di dîrokê de di nava taritiyê de



nemîne, rahişte çekê û parastina xwe kir û têkoşînê di bin sîwan şerê çekdarî da meşandin.

**2- Ev ne cara yekê ye ku Rêber Apo ji bo demokrasî û aştiyê bang dike, lê cûdabûna vê bangê ji bangên din çi ye?**

Di van salên dûrûdirêj de gelek caran Rêber Apo bangewaziya aştiyê kiriye. Armanca rahiştina çekê ji destpêkê ve ew bû ku mafê gelê kurd bê dayîn û parastin. Dema ku ev maf nayên dayîn, li kêlekê wê zindan ji siyasetmedar, welatparêz, nivîskar û heta hunermendekî ku bi zimanê kurdî stranê xwe digot werine dagirtin, ji bo wê jî rakirina çekê xweparastina rewa ye ku bikaribin gelê kurd biparêzin û nehêle ku armanca dewleta Tirk biser bikeve.
13 caran di van salê dirêj de Rêber Apo bengewaziya aştiyê kiriye, her carekî ji aliyekê ve dihat. Lê cûdabûna vê bangê ji carê din ew e ku êdî aliyên Tirkî bi xwe jî gihane wê qeneatê ku ne dikarin pirsgirêka kurd tune bikin, ne jî dikarin gelê kurd vegerîne ji derveyî ropelên dîrokê û bi şer, pevçûn, dîlgirtinê naghên armancên xwe. Herwiha hebûna gelê kurd a ku bi têkoşîn û berxwedana xwe isbat kirine, mayînde bûye, êdî nema dikarin ku tune bikin. Ji bo wê jî hem li aliyê Rêber Apo bangewaziya aştiyê, hem jî rayedarên dewleta Tirk, rayedarên partiyên siyasî yên li Tirkiyê kar û xebatên xwe dikin, her kes gihşt wê encamê şer û pevçûn ne rêya çareseriyê ye. Ji bo wê jî cûdabûna vê bangê ji bangê beriya wê ew e ku bangewazîkî raya giştî ew pejirand û zanî ku bersiva pêvajoyê ew e şer were rawestandin û bi rêya hiqûqî, destûrî an jî dadmendiyê pirsgirêk were çareserkirin.

**3- Ji dema banga Rêber Apo hatî dayîn û heta roja îro dewleta Tirk çi gav avêtiye? Herwiha ji banga Rêber Apo heta niha êrişên dewleta Tirk li ser qadên berxwedanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê nehatiye rawestandin, ev yek wê ji bo pêvajoya aştî û demokrasiyê çi bi xwe re bîne?**

Çiqas ku em bêjin dewleta Tirk ev bangewazî erênî dît û gihane wê encama ku çareserî bi diyalogê ye. Lê heta niha tu gav navêtiye, berovajê vê şer nehatiye rawes-



tandin çi li qadê berxwedanê, çi li sernaserî sînor, li Başûrê Kurdistanê. Herwiha li Bakurê Kurdistanê avêtina qeyûmên li ser şaredariyan hîn berdewam e, çalakiyên tên çêkirin, têne qedexekirin, ev hemû jî gavên ber bi xetmandinê ve ye. Dîsa dixwazin vê gavê wekî gavên din vala derbixin, dewleta Tirk ne cidiye ji bo rawestandin şer. Piştî axaftina û banga Rêber Apo Partiya Karkerên Kurdistan PKK'ê jî gotin em şer radiwestînin û agirbest ragihandin, ev yek jî wek gava yekemîn a rawestandina şer e. Gavên din dema şer were rawestandin wê gav bi gav di aliyê qanûnî, destûrî û mafê gelê kurd bikeve giftigoyê de, herwiha kongr werin avakirin. Gelê kurd û partiyên kurdî bi erêniya xwe dest bi kar û xebatên ji bo xizmeta vê qonaxê bikin, kirine. Lê dewleta Tirk heta niha tu gav navêtiye û tê xuyakirin ku dewleta Tirk di diyalog û biryarên xwe de ne cidî ye. Ji bo wê em dibînin di nav dewleta Tirk bi xwe de hêzên tarî û veşartî hene ku li ser şerê tê kirin û berdewamkirina şer bisûdin. Bandora vê gavê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî, gavekî ku wê bandora xwe gelekî mezin li ser herêmê jî bike. Ji ber ku her tim behanê dewleta Tirk ew bû ku hêza QSD'ê hêzekî bi PKK'ê ve girêdayî ye û hêzekî ku ne Sûrî ye, ji bo wê jî dema ku şer were rawestandin wê bandora xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bide çêkirin. Hem jî rêya diyalogê dema bi dewleta Tirk û PKK'ê re tê vekirin, wê Sûrî jî bighên wê encamê ku wê diyalog bi QSD'ê û hikumeta Şamê re jî were çêkirin, lewra bandora banga Rêber Apo li ser giştî Rojhilata Navîn heye.

# 'Jin wê bi têkoşîna xwe mafê xwe misoger bike'

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Endama Koordînasiyona Jin a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emîne Umer diyar kir ku pêwîst e jin asta berxwedanê bilind bikin û parastina cewherî xurt bikin û got: "Pêwîst e jin di avakirina Sûriya nû de hebin û mafên wan bên misogerkirin."**

Piştî helwişîna Rêjîma Eseed gelek buyer hatin qewmandin, di nav de rewş û pêşerojê jinê ye. Pirsa ka wê siberoja jinê di Sûriya nû de çawa be, di serê her kesê de ye. Li gorî tê dîtin, desthilatdariya Şamê ya nû dixwaze jinê ji holê rake û wê bê maf bihêle. Lê jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku pêşengiya şoreşa gelan kirin bi tu awayî nêzîçkatiyên desthilatdariya Şamê qebûl nakin û herdem ew tekez dikin ku wê têkoşînê dewam bikin da ku mafê jinê di Sûriya nû de misoger bikin.
Derbarê rewşa Sûriyê de û bi taybet siberoja jinê, endama Koordînasiyona Jin a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emîne Umer ji Rojnameya me re axivî.
Emîne Umer di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Di nava sê mehan de gelek guhertin di Sûriyê de pêk hatin. Colanî û hevkarên wî destpêkê kongireyek ji xwe li dar xistin û Colanî wekî serokê Sûriyê ji aliyê wê kongreyê ve hat destnîşankirin. Aliyek tenê li Şamê ye û bi xwe biryaran dide û ji bo berjewndiyên xwe yê desthilatdariyê kar dike. Ev yek dide xuyakirin ku tu guhertineke erênî di Sûriyê de pêk nehatiye. Raste rêjîma Bass hat helweşandin, lê yên hatin şûna Bass wekî wê ne. Belê em dibînin ku çawa Colanî di daxuyaniyên xwe de herddem behsa pirrengiya Sûriyê û yekîtiya pêkhateyan dike, lê tenê axaftinin, heya niha di pratîk de ew berovajî axaftina xwe dike. Ji ber wê di vir de nakokî tê avakirin. Em balê bikşînin ser mijara jin di hundirê Sûriyê de ku hebûna wê dixwazin bidin winda kirin, heya niha her nîqaş û kongirên ku tên



lidarxistin hikumeta Şamê jin tevlî nekiriya. Ev bi serê xwe xeteriyekî bi xwe re tîne. Cihê ku jin tê de tune be ew cih tê hilwişandin ango ne bi awayekî adalet û aşîtî tê meşandin."

**Hebûna jinê di Sûriya nû de**

Emîne da zanîn ku gelê Sûriyê di gelek şer, pevçûn û qirkirinan re derbas bûn, ji ber vê yekê ew cudakirina di navbera pêkhate û mezhebên herêmê de tu carî qebûl nakin û wiha pê de çû: "Divê em yekrêziya xwe ava bikin da ku bikaribin Sûriya nû jî ava bikin. Di heman demê de daxwaza me ew e ku sîstema nû ya rêveberiyê jî hevpar be, rola jinan tê de hebe ku hebûnên xwe nîşan bidin û beşdarî cihên biryardayînê bibin. Gelek jinên xwenda, zana û pêşketî di nava civakê de hene, dikarin nûnertiya gelê xwe bikin. Îro jin di Sûriyê de tekoşînekî pir mezin daye meşandin û heya roja îro jî berxwedanî û tekoşîna xwe didomîne, ne mumkine ku piştî ewqas ked û berdêlên giran yê di şoreşê de hatin dayîn, bi destî were qebûlkirin, em ê heya dawê li ser piya bin û dengê xwe bilind bikin tenê ji bo mafê me neye xwarin."

**'Jin dayîk e, mamoste ye, xwişk û hevjîn e'**

Emîne Umer diyar kir ku divê di avakirina Sûriya nû de rol û hebûna jinan bê misogerkirin û wiha domand: "Pêwîst e Sûriya azad û demokratîk a ku tê de hemû mezheb û pêkhate bi azadiya xwe bijîn, werê avakirin. Rola jin û ciwanan jî di avakirina Sûriya nû de gelek girîng e û divê dengê xwe bi awayekî azad ragihînin. Em dixwazin rola wan di nava civakê de aktîv be û mafên jinan di avakirinê de misoger bikin. Jin dayîk e, mamoste ye, xwişk û hevjîn e, ew bi destên xwe nifşan ava dike. Gelek xwedawendên jin di dîrokê de hene, rolên siyasî, civakî û leşkerî lîstine. Rola wan rolek bingehîn e di civakan de. Divê em balê bikşînin ser rola jinan a zêde. Rola wan ji ya mêran mezintir e, ji ber ku ew wan xwedî dike û mezin dike. Bi saya jinan mêr dighîjin cîhên rêvebirinê."

**'Pêwîste Sûriyê hemû pêkhateyên xwe hembêz bike'**

Endama Koordînasiyona Jin a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emîne Umer di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em Sûriya bi aştî û azad hêvî dikin. Di heman demê de em Sûriya azad ji hemû pêkhate û neteweyên Sûriyê re dixwazin. Dema ku Sûriye hemû pêkhateyên xwe hembêz bike, wê demê welatek demokratîk û azad jî dê bê avakirin. Her kes wê bi reng û çanda xwe bijî û wê ji çand, hebûna û zimanê xwe mehrûm nemîne."



# Beha Şêxo; xwediyê deng û awazên resen

Hunermend Beha Şêxo diyar kir ku ji biçûkaniya xwe ve ew hogirê mûzîkê bû, ji ber ku kesayetek wek Mihemed Şêxo di mala wan de bû. Di heman demê de bavê wî jî stran digotin ev yek bandor li hestên wî yên hunerî jî kir.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Li Rojavayê Kurdistanê gelek hunermendên ku bi dengê xwe hezkirina xwe xistin di dilê civaka kurd e hene. Yek ji wan hunermendan ku bi dengê xwe hestên civaka xwe vedibêje, hunermend Beha Şêxo ye.
Di derbarê jiyan û hunera xwe de hunermend Beha Şêxo ji Rojnameya me re axivî.

**Kurtejiyana Beha Şêxo**

Beha Şêxo di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser zaroktiya xwe û wiha got: "Em 6 xweşîk û 6 bira bûn di malê de, lewa rewşa me ya abûrî gelekî zehmet bû. Ez 4 salî bûm êdî min dest bi karê çandiniyê û avdaniya pembû kir. Gelek roj bi ser min re derbas dibûn ku ez ji westandina zêde di nav şelên pembû de bi xew ve diçûm. Li kêlek kar min xwendina xwe jî berdewam kir heya refa 6'an min li gundê xwe qedand. Di sala 1977'an de min berê xwe da Qamişlo û li wir xwendina navîn dest pê kir, her sal min xwendina xwe li dibistanekî diqedand ji ber kiriya xaniyan buha bûn. Lê dema ez bûn refa 9'an min berê xwe da şamê da ku ez li wir kar bikim, dema ez vegeriyam ji şamê ji ber mezinbûna temenê min ji bo refa 10'an ez hat redkirin ji tomarkirinê. Lewma ji xwendinê dûrketim êdî min berê xwe da hunerê.
Nemir Mihemed Şêxo gelekî destek dida min da ku ez xwendina xwe berdewam bikim, dema ew li Îranê bû ez û wî bi riya nameya bi hev re diaxivîn her 6 mehan carekî mektûbên me digihiştin hev. Dema naskir ez ji xwendinê dûrketime gelekî xemgîn bû, ji min re got ku min hesabê te kiribû tu piştî refa 12'an derkevê jiderveyî welat da ku zanîngehê li wir temam bikî. Di sala 1980'î de piştî qutbûna min ji xwendinê êdî min li gel hevalên xwe dest bi karê destan kir, wan bilat datanîn min jî çîmentoya wan çêdikir. Ji ber ku ez piçûk bû ev kar li ser min



zehmet bûn. Di sala 1981'an de ez çûm leşkeriyê, min 4 sal û 3 meh leşkerî kir. Piştî 9 salan qutbûna min ji xwendinê, di sala 1988'an de min refa 12 xwend û min mafnasî li Libnanê tomar kir, lê piştî koçkirina Mihemed Şêxo min nikarî ez berdewam bikim."

**'Dengbêjiyê karî bandorê li hestên min bike'**

Şêxo anî ziman ku wî ji refa 3'an ve dest bi muzîkê kir û wiha got: "Heya niha ew kasêt li gel min heye dema ku min cara yekem stran digot û Mihemd Şêxo li kemanê dida. Di malbata me de bandora dengê Mihemed Şêxo û dengê bavê min gelek hebû, di heman demê de çavkaniyên guhdarkirinê radiyo bûn. Dengbêjên kevin wan jî karî gelek bandorê li hestên min yên srtanbêjiyê bike. Ji ber ku hezkirina min ji mozîkê re hebû dema şahî li gund çêdibûn ew stranên ku dihatin gotin yekser min ezber dikir. Cara yekem di sala 1977'an de min li bajarê Qamişlo strand, dema ez derketim li ser dikê laşê min dilerizî, heyecanê ez girtibûm. Dema di sala 1974'an de Mihemed Şêxo ji bajar bar kir gel hemû xemgîn bû, ji ber ku pêve hatibûn girêdan. Dema yê pêşkêşvan bang kir ku wê niha birayê hunermend Mihemed Şêxo bistirêne gelên ku li wê şahiyê hazir nebûbûn jî xwe li ser dîwaran avêtin û hatin şahiyê. Di wê demê de min tenê stran digotin, hîn min saz lê nedixist, rehmetî Hemze Yûsiv bi min re li sazê xist. Ev bû gava destpêkê ji bo min ku ez li pêşiya gel bistirênim û heyecana xwe bavêjim."

**'Mihemed Şêxo pêşengê min bû'**

Şêxo axaftinên berdewam kir û wiha got: "Di sala 1980'an de min û hevalên xwe li gel mamosteyê nemir Ehmed Hisên korsên mozîkê vekirin, cihê me jî li Enteriyê bû. Li wir me odeyek kirê kiribû û waneyên mozîkê dibirin. Ez li ser tembûra bê perde fêrî mozîkjeniyê bûm, dema min li tembûra bi perde da êdî min zanî ku vaye asteke min ya baş çêbû. Hin hevalên min hebûn endamên Komekî bûn, bang li min jî kirin da ku ez jî bibim endamê wê komê. Destpêkê koma me bê nav bû lê paşê me navê wê kir koma Xelat. Nêzî 3 salan ez mam endam di vê komê de û me şahiyên Newrozê lêdixistin û ez di Qamişlo de hatim nasîn. Di sala 1984'an de min li keman dijenand û Mihemed Şêxo stran dikotin heya niha jî ew kasêt hîn li gel mine. Mihemed şêxo karî gelek peyaman bi riya hunera xwe bighîne, netenê bandorê li min bike, lê li nifşên îro jî kir. Dema ku min di sala 1985'an de leşkerî bidawî kir, biryar da ku ez careke din karê xwe yê bilata berdewam bikim, lê Mihemed Şêxo qebûl nekir. Ji min re got ku deng û saza te xweşe cend mihan bi min re derkeve dawetan da ku tu şêwaz fêr bibe. Di sala 1986'an de êdî min bar rakir ser milê xwe ku berpirsiyariya mala Mihemed şêxo rajimê. Min dît wek erkekiye li ser milê min ku ez xwe jê re bi terxînim. Di sala 1987'an de me tomargeha Felek vekir lê mixabin em pê şa nebûn rêjîma Bees gelek pirsgirêk çêkirin û mûma sor lê xistin. 5 sal û 3 mehan tomargeh ma girtî. Lê min gelek têkiliyên xwe kirin da ku ez vê bîranîna ku Mihemed Şêxo ji bo me hiştî vekim. Di sala 1989'an de birîneke kûr li birînên me zêde bû ku mamoste û pêşengê min koça dawî kir. Ji bo min gelek bi êş bû ji ber ku me sînorên biratiyê derbas kiribû. Lê ji mirina wî û şûnde min rêya Mihemed Şêxo berdewam bikim. Raste bandora Mihemed Şêxo li min hebû, lê stayla min ya stranbêjiyê cûdaye û di heman demê de dengê min jî ne wek ê Mihemed Şêxo ye. Dema ez stranên wî dibêjim ez bi hestên xwe dibêjim."

**Vegera Qamişlo xewna Beha Şêxo bû**

Hunermend Beha Şêxo axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: "Ji sala 2002'an heya ketina rîjîma Bees derket min qedexe bû ku bê erêkirina hukumeta Şamê ez ji Sûrî derkevim. Carnan xwesteka derketina min erê dikirin û carnan jî red dikirin ev jî astengî bûn li pêşiya min. Di sala 2005'an de dema ez hatim vexwendin li Siwêdê hevalên min ji min re gotin venerge Sûrî ji ber heger tu vegerê yeksê tê bê girtin êdî ez neçar mam ku li wir bimînim. Nêzî 4 sal qediyan heya min karî ez zarokên xwe bînim cem xwe li Siwêd. Li wir jî me jiyana xwe bi stranbêjiyê derbas kir. Ez bi gelek kar û xebatan rabûm li Siwêd ji bo gelê Sûriyê him me pere kom dikirin û him jî cil û berg. Raste ez li Siwêd bûm lê min rojekî jî xwe li Siwêd nedidît, lewma dema ku sînor vebûn di sala 2015'an de min biryar da ku ez vegerim cih û warê xwe. Beriya çend salan dema ku nexweşiya korona bû ez çûm lê careke din di sala 2021'an de vegeriyam welatê xwe û niha jî jiyana xwe li Qamişlo berdewam dikim bi şahî û bişevbuhêrikan."

**Berhemên Beha Şêxo**

-Di sala 1990'î û 1992'an de yekm albom tomar kir.
- Di sala 1997'an de kasêta bi navê 'Lava' Tomar kir.
-Di sala 2000'î de kasêta bi navê Qamişloka Evînê tomarkir.
- Di sala 2002'an de starana Ji mir gotin li Qamişlo tomarkir.
-Di sala 2005'an de kasêta Gelo tomarkir.
-Di sala 1994'an de yekem car ez hat vexwendin ji bo şahiya Newrozê li Rûsiya û Okraniya.
- Di sala 1997'an de hat vexwendin li Stembolê.
-Di heman demê de wek hunermendekî kurd di sala 2000'î hat vexwendim li Siwêd ji bo cejna Newrozê.
-Di sala 2001'ê de ez hat vexwendin li îmarat."



# Baas hilweşiya, lê zihniyeta desthilatdariyê neguherî

Di 15`ê Adara 2011`an de gelên Sûriyê  ji bo azadî û demokrasiyê li dijî rêjîma Baas serî hildan. Lê ji ber destwerdana hêzên derve serhildana gel veguherî şerê navxweyî û beşek berfireh ji xaka Sûriyê hat dagirkirin. Piştî têkçûna Baas û hatina HTŞ'ê li ser desthiladariya Şamê tu guhertin di hişmendiya desthilatdariyê de çênebû.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Bi sed hezaran gelê Sûriyê di şerên nêzî 15 salan de dirêj kir xizmên xwe, ji dest dan. Herwiha ev şer bû sedema koçberkirin, wêrankirin, binçavkirin û kuştina bi milyonan mirov. Heta roja îro jî bi sedan kes çarenûsa wan ne diyare û windayîne.

Li Rojavayê Kurdistanê bi despêka Bihara Gelan re rewşek cudatir diqewimî. Gelê vê herîmê felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, weke xêza sêyem hilbijartin û têkoşînek bi dehan salan domandin. Ji aliyê rêxistinkirin, perwerdekirin, parastina mafê gelê tevahiyê herêmê û bi rengekî azad û demokratîk, derdikete holê.

Ji destpêka şerê Sûriyê di 15`ê Adara 2011`an de, Sûriyê di gelek rewşên dijwar û aloz de di astên cuda de derbas bûye, çi ji aliyê mirovî, siyasî û leşkerî û civakî ve be. Ev pevçûna ku bi xwepêşandanên aştiyane yên daxwaza veguhertineke ber bi demokratîk ve dest pê kir, veguherî şerê navxweyî ku heta roja îro didom e.

## Bandora şer li ser Sûriyê

Têkçûna binesaziyê: Şer gelek bajarên mezin ên Sûriye wekî Haleb, Şam , Derazorê û Himsê hilweşand. Bê gûman têkçûna binesaziyê bandora wê li nexweşxaneyan, dibistanan, malên welatiyan û rêyên mezin yên girîng yên bajar û herêmên mezin jî kir. Herwiha ji ber têkbirina ewlehiyê, bi milyonan welatî koçberî welatên derve bûn.

## Koçberî û penaberî

Şer bû sedema mezintirîn kirîza koçberî û penaberiyê di dîroka herêmê de. Bi milyonan welatiyên Sûrî reviyan welatên cîranan û Ewropayê, ev yek jî bû mîna pêşbira mirovî û siyasî li welatên ku koçber lê bi cih dibûn.

Bi destpêkirina kirîzê re, gelek komên cuda yên siyasî û leşkerî derketin holê, ji wan jî ev in; Ji komên çete yên ku navê  Artêşa Azad ya Sûriyeyê  li xwe kirin  û komên Îslamî yên radîkal derketin. Armanca van koman ew bû ku li hember rejîma Sûriyê şer bike. Lê bi demê re ew bûn gelek komên cûda, hin ji wan ji aliyê welatên herêmî û hin jê ji aliyê hêzên navdewletî ve, dihatin piştgiritin. Herwiha gelek aliyên siyasî yên ku navê oposisyonê li xwe kiribûn derketin û berjewndiyên Tirkiyê û welatên din didan pêş.

## Rêxistina gel li Rojava

Li Rojavayê Kurdistanê, di dema şerê navxweyî yê Sûriyê de, Şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê kir, herêmê bi hemû pêkhateyên xwe, felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, weke xêzeke sêyem ya dervî şer hilbijartin. Bi rêyên demokratikî xwest ku mafên xwe bidest bixe. Dewleta Tirk ya dagîrker, ji bo Rojavayê Kurdistanê nekeve bin siya kurdan, her tim di rêya êrîşên xwe yên hovane, dixwest ewlehiya herêmê têk bibe. Lê armanca wê pêknehat û bi vê mebestê li gund û taxên Rojavayê Kurdistanê dest bi avakirina komînan hat kirin. Di Cotmeha 2011'an de wekî sîwaneya sazûmaniyan TEV-DEM hat damezirandin. Piştre Meclisa Gel ya Rojavayê Kurdistanê (MGRK) ku ji 354 kesan pêk dihat û sedî 40'ê ji wê jin bûn hat avakirin.

Li aliyê din bi pêşengiya TEV-DEM'ê bi beşdariya hemû pêkhateyên li Rojavayê Kurdistanê çalakî dihatin lidarxistin û vediguherîn rêxistinbûnan. Ji komînan heta meclîs, perwerde û parastinê gav hatin avêtin. Berî her tiştî ji bo herêmê ji êrîşan were parastin, Sala 2011'an Yekîneyên Parastina Gel (YPG) wekî hêza parastina tevahiya pêkhateyan hat avakirin. Tevî gelek alozî û tevliheviya li Sûriyê, projeya Rêveberiya Xweser, ji bo gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, destkeftiyeke mezin bû. Rêveberiyê, gelek herêm ji şerên ku welat wêran kirin, parast û ewlehî û aramî lê pêk anî. Li aliyekê xebata yekrêziya Kurdî dihat meşandin, li aliyê din bi pêkhateyên din ên herêmê yên Ereb, Suryan, Ermen re danûstendinên ji bo têkoşîna yekrêzî û azadiya gelan hatin meşandin. Di vê çarçoveyê de hemû pêkhateyên herêmê (Kurd, Ereb, Asurî-Suryanî, Ermenî) xwe ji destwerdanên derve dûr girtin, pişta xwe nedan tu hêzên din û rêya sêyemîn hilbijartin.






## Armanca sereke parastina mafê hemû gelan e

Di salên şer de rêveberiya herêmê ne xwest ne li kêleka hêzên çekdar ne jî bi rejîma Sûriyê ya Eseed de bikeve nava şer de. Tevlî ku hewldanên dewleta Tirk ya dagîrker hebû ku kurdan tevlî şer bikin. Lê gel li hember van planan bi saya fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, hişyar bû. Li ser vê felsefeyê hêdî hêdî gel li kêleka Rêveberiya Xweser dest bi kar û xebatên xwe kirin.

Ji ber ku gel bi ziman û çanda xwe tê naskirin, rêvebriyê girîngî da zimanê dayîkê û rojbiroj sal bi sal dest bi rêxistina dibistan, peymangeh û zanîngehan kirin. Ji ber ku li herêmê û tevahiya Sûriyê rejîma Eseed zinamê dayîkê qedexe kiribû, gelê me jî bi vê hişmendiyê bandor bibû destpêkê fêrkirina zimanê dayîkê li dibistanan red kirin. Lê mamostyên zimanê kurdî dev ji armanca xwe bernedan û karê xwe berdewam kirin. Êdî bi saya berxwedana şervanan û xwîna şehîdan peymangh û zanîngehê yên bi zimanê dayîkê hatin birêxistin kirin û bi sedan xwendekar serkeftî xwendina xwe ya di zanîngehan de qedandin.

Ji ber ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bi xwe avakirin rastî gelek êrîşan hatin û heta niha jî rastî êrîşan tê.  Lewra Gavên ku di sala 2012'an dihatin avêtin êdî ber bi şoreşekê ve diçûn. Çirûska şoreşê roja 19'ê Tîrmehê (2012) li Kobanê hat destpêkirin. Piştre li bajarên Efrîn, Serêkaniyê, Dirbêsiyê, Amudê, Dêrik, Girkê Legê, Tirbespiyê, Qamişlo, Til Temir, Hesekê belav bû. Bi rizgarkirina bajaran re, yêdî hêvî û baweriya gelan ya ji bo jiyanek hevbeş û azad xurt dibû, hêzên parastinê her ku diçû bihêztir dibûn.

## Piştî 8`ê Berfanbara 2024'an

Bê goman 8`ê Berfembara 2024'an ji bo gelê Sûriyê rojeke dîrokî bû. Piştî ketina rejîma Sûriyê, HTŞ'ê desthilatdariya Şamê bi dest xist û Colanî wekî serok nîşan kir. Herwiha kongireyek li Şamê lidar xist û tevahiya gel û pêkhateyên cuda yên Sûriyê paşguh kir. Di dema dawî de gelek komên çekdar yên girêdayî HTŞ'ê ku kes nizane bingeha wan ji kuderê ye, di derheqê welatiyan bi taybetî di derheqê Elewiyan de, gelek komkujî pêk anîn û di encamê de zêdetirî 1500 welatiyan jiyana xwe ji dest dan.

Bi armanca parastina mafê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybetî gelê kurd û rêgirtina li ber komkujiyan, Di 11`ê Adarê de Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mazlûm Ebdî û serokê Şamê Ehmed El Şeri di peymanek ku tê de xalên girêdayî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hene, îmze kir. Li gorî naveroka peymanê ya ku hatiye belavkirin û di dawiyê de Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mazlûm Ebdî  û serokê Şamê Ehmed El Şeri îmze kirine, ji 8 bendan pêk tê û wiha ye:

Li ser îmzekirina peymanê jî Fransa Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û rêvebirê Şamê de pêşwaz kir û got ev gaveke erênî ya ber bi çareseriya dan û standinê û aştiyê ye ku Sûriye bibe yek û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tev li pêvajoya veguhastinê ya siyasî bibe.

Herwiha di 13`ê Adarê de Komîteya "Sazkirina Danezana Destûrî" li Sûriyeyê ya ku ji hêla desthilatdariya  Şamê ve Ehmed El-Şeri hatiye erkdarkirin, hat îmze kirin. Pêşnûmeya "Danezana Destûrî" ji bo qonaxa veguhêz a desthilata Şamê, ku ji pêşgotin û 4 beşan pêk tê, hat îmzekirin. Li gorî reşnivîsa destûrê ku hatiye ragihandin, tevahiya gel , pêkhate, ol û etnîkêl li Sûriyê ji mafê xwe bêpar dimînin. Li ser vê bingehê ev destûr ji aliyê kurd, durizî , xiristiyan û Elwiyan ve hat redkirin û li dijî wê gelek çalakî û xwepêşandan hatin lidarxistin.



# Aldar Xelîl: Dermanê birînên gelên herêmê projeya Netewa Demokratîk e

Endamê Desteya Rêveber a Hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl da xuyakirin ku banga Rêber Abdullah Ocalan di hemû aliyên azadîxwaz de kelecanek daye avakirin û wiha got: "Pêvajoyên wiha pêvajoyên wêrekîyê û dîrokî ne, bîrinên gelê Kurd hatine dîtin lê ne hatine dermankirin. Dermanê birînên civakê tenê di hundirê felsefeya Rêber Apo de veşartî  ye."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di derheqê peyama dîrokî ya Rêber Apo Banga Aştî û Civaka Demokratîk de û pêvajoya hatiye destpêkirin de, Endamê Desteya Rêveber a Hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:



**- Rêber Abdullah Ocalan di 27'ê Sibatê de bi navê "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" peyamek dîrokî da û wê peyamê li tevahiya cîhanê deng veda. Li gorî we tişta ku vê peyamê dike rojeva sereke ya cîhanê çi ye?**

Doza kurd û Kurdistanê li Rojhilata Navîn bi sedan sal in bûye pirsgirêkekî bingehîn. Ji bona hebûna xwe gelê Kurd têkoşîn dike û di demên dawiyê de jî ev gehişte lûtkeya serkeftinê. Di her çar beşên Kurdistanê de jî siyaseta qirkirin û tinekirinê li ser kurdan dihate meşandin. Ji bona têkbirina hêz û civaka gelê Kurd hêzên netew-dewlet yên ku herêmê de cih digirin xwe kirin yek. Li ser wê bingehê jî derketina PKK'ê weke vejîna hebûna gelê Kurd dihat pênasekirin. Ev nêzî 50 salin jî Tevgera Azadiyê têkoşîna hebûn û tinebûnê dide meşandin. Dema Rêber Apo dest bi têkoşîna şoreşgerî kir, rewşa civaka Kurd ne baş bû û ber bi tinekirinê ve diçûn. Di wê serdema ku dest bi têkoşînê hatibû kirin de, li Başûrê Kurdistanê Mela Mistefa Berzanî "aş û betal"  hatibû ragihandin. Li Rojhilatê Kurdistanê di nav qeyranekî mezin de bû û  li Bakurê wêlet jî piştî damezirandina Komara Tirkiyê gelek komkujî li serê gelê Kurd û pêkhateyên din jî, pêk dihatin. Ev serhildanên ku di navbera dîroka 1925 û heya 1940'î de berxwedaniya li hemberî qirkirina kurdan bû. Di wan serhildanên hatin kirin de jî hatin tepisandin û gelek pêşengên kurdan ji aliyê dewleta Tirk ve hatine darvekirin. Ev serdema têkoşînê gelek caran merhele guhertin û tevgera azadiyê xurt bû. Piştî derketina Tevgera Azadî û Rêber Apo gelê Kurd bi pêkhateyên din re têkoşîn kir hevpar û berxwedaniyekê mezin meşandin. Li ser wan pêşketinên Rêber Apo 27'ê Sibata 2025'an de nameyekî bi riya desteya Dem Partiyê şand û bangewazîyekî dîrokî ji bona Tevgera Azadî û hikûmeta Tirk hate kirin û ev bang di cîhanê de jî deng veda. Ev peyam tê wateya rûpelekê nû ya têkoşîna azadîyê. Têkoşîna cîhanî û Kurdistanî sedsala 21'emîn de derbasî qonaxekê nû bû. Li Rojhilata Navîn piştî 15'ê Sibata 1999'an bi komploya navnetewî û piştî salên 2010'an jî derbasî qonaxekê din ya têkoşînê bûn. Taybet herêmên Rojhilata Navîn yên welatên gelê Ereb piranî tê de jiyan dikin piştî 2010'an de guhertinên asta jor de hatin jiyankirin. Lê şûna wan guhertinên despotîk û desthiladariyên netew-dewlet alternafîke demokratîk nehate danîn. Dema li gorî wan pêşketinên Rêber Apo paradîgma da guhertin "Manîfestoya şoreşa Kurdistanê" da avakirin. Ev girîngiya wê bangê jî di vir de veşartî ye û ev gelek girîngê ji bona bê fêmkirin. Dema ku te guhertinek kir pêwîste şêwaz û amûrên berê dihatin karanîn bê nûkirin. Ji ber dema Rêber Apo hewildan kir ku paradîgmayê biguhere û bide fêmkirin, ji ber ku li ser Rêber Apo tecrîd hebû û ev derfet ne hatibûn avakirin û Rêber Apo ne dîkarî Tevgera Azadiyê û gelê Kurd re bide pejirandin. Piştî wê bangawaziyê em dibînin ku ev derfet hate avakirin û Rêber Apo guhertina paradigmayekê ragihand û rêxistin û tevgera azadiyê jî li gor wê paradigmayê xwe nûve avabike. Ji ber ev peyam xwedî cihekî girînge ji bona demokrasî û azadiya Rojhilata Navîn û cîhanê giştî jî.

**-Li gorî we jî ji bo ev peyama ji aliyê Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan hatiye dayin bê fêmkirin çi ye û çi derdikeve pêş?**

Peyama Rêber Apo ya ji bona çareseriyê Tevgera Azadiyê û aliyên peywendîdar re pêşkêş dike çareseriya mayinde û domdar e. Gelek alî û derdoran li qala pirsgrêka çareseriya Rojhilata Navîn kirin û gelek kesayetan jî gotin em ê wê pirsgirêka dîrokî çareser bikin lê ti kesê ne anî li ser ziman ku dê ew çawa pêk were. Raste, herkesê guhertin dixwest û ji aliyê hemûyan ve pirsgrêk dihate dîtin û nîqaş kirin. Ev hat piştrastkirin ku piştî bangawaziya Rêber Apo çareseriya pirsgirêkê û alternatîfê wê peyda kir. Ev derfet hemû aliyên ku wê pirsgrêkê weke pirsgirêka xwe dibînin ve hat pêşkeşkirin û divê ev derfet baş bê bikaranîn. Ev herêma ku em têda jiyan dikin, pirsgirêka herî mezin ya pêşiya civakê ev bû ku desthiladariyeke navendî, yekdestî û ne pejirandina mafên wan yên bingehîn bû. Çareseriya wê jî azadî û demokrasî anîna herêmê ye û ev xal in jî hemû paradîgmaya Rêber Apo de hebû û çareseriya wê jî hat danîn. Piştî pêvajoya 2016'an dewleta Tirk ya dagirker qirkirinekî piralî li ser gelê kurd da meşandin û ev qirkirin di sala 2018'an hat berfirehkirin  û bingeha êrîşên leşkerî hat avakirin. Ev pêvajoya ku Rêber Apo daye destpêkirin, tê wateya ku hikûmet û rayedarên dewleta Tirk ya dagirker pir tengav bûne û metirsiya têkçuyîna desthildariya xwe jiyan dikin. Pêwiste em jî weke endam û welatparêzên Tevgera Azadiyê wê pêngavê xurt bikin û divê em piştgirî bidin vê pêvajoyê. Ev bangewazî tenê ne li Sûriyê bi tevahî Rojhilata Navîn bike. Ji ber ev pêvajoya ku Rêber Apo daye destpêkirin bê astengî bimeşe, ev pergala Netewa Demokratîk ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye pergala jiyanê, di heman demê de bibe pergalekî cîhanî. Ji ber ku welatên li erdnigariya Rojhilata Navîn de cih digirin alozî û qeyranekî mezin jiyan dikin, sedema herî bingehîn jî ew e ku şêwaza rêvebirina welatên wan pergala netew dewletê ye. Birînê gelên Rojhilata Navîn hatine vekirin lê hîna ne hatine dermankirin. Dermanên birînên gelê herêmê projeya "Netewa Demokratîk" e.

**-Ji gotina 'Civaka Demokratîk' ku di heman demê de sernavê peyama Rêber Apo ya dîrokî ye. Civaka Demokratîk çi ye û divê çi were fêmkirin?**

Ev peyama Rêber Apo ne ya roja me îro ye, beriya salan Rêber Apo ev peyam da civakê. Yên ku hezdikin wê peyamê fêhm bikin divê paraznameya Rêber Apo ya 5'emîn bixwînin. Nameya Rêber Apo de, mirov rihê dîrokî ya ku hewildida bide fêmkirin bibîne. Rêber Apo peyamê de dibêjê biçin; "Paraznameya min ya 5'emîn pêk bînin."  Ji ber ku paraznameya 5'emîn beriya salan civakekî demokratîk dide avakirin û ev ezmûn li Bakur û Rojhilatê Suriyê jî hat dîtin. Piştî  2011'an em hewil didin wê pergalê bikin pergala tevahî Sûriyê. Em hewildidin ku civakekê rêxistinkirî, bîrawer û demokratîk bidin avakirin û civak bikarê bixwe xwe rêve bibe. Rêber Apo dibêje "Aştî û Civaka Demokratîk." Aşitî; şer û êrîş bê sekinandin û derfetên danûsitandinên siyasî bê avakirin, Civaka Demokratîk jî; civakekê ku derveyî pergala netew dewlet bi rêveberiya gel bê avakirin e. Li gor rastiya azadiya jin û civakê bê rêxistinkirin. Ev jî bi pêşxistina hişmendiya demokratîk pêkan e.

**-Li ser peyama dîrokî ya aliyê Rêber Apo hatiye dayin de, gelek derdor û aliyên pirgisrêka Kurd ji nêz ve dişopînin hate nirxandin û şîrovekirin. Kîjan alî çawa nêz dibe û nêzikbûnên erenî û hebe yên neyinî çawa ne?**

Ji ber ku peyamekê pir girîng û wate ye çi alî neman ku li ser wê peyama Rêberê gelan Rêber Apo keyfxweşî û şanazîya xwe ne anîn li ser ziman. Saziyên navnetewî, welatên di cîhanê de bibandor û civakên  azadîxwaz piştgiriya xwe ji bona name û pêvajoya Rêber Apo jê re, pêşengtiyê dike da xuyakirin. Çiqasî ku gelek aliyan li gorî berjewendiyên xwe jî lê mêze dikirin lê bi gelemperî nêzîkatî pir erenî û bandor bûn. Ev nerîna ku cîhanê hevpar derketî jî li hemberî peyamê ev bû ku; gavekê wêreke û dê bibe destpêka aşitiya cîhanê û firsendekê dîrokî ye. Dema ku wisa tê nirxandin û baldarî nêz dibin ev erkê li ser wan zêde dibe û divê xwedî derketin jî li gorî wê bê avakirin. Giştî alî û derdorên aşitîxwaz pêwiste destê xwe dayinin li bin kevirê de. Pêwîste beriya herkesî gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn xwedî derbikeve û bide fêmkirin jî. Ev peyam ne tenê ji bona PKK'ê û Tevgera Azadiyê bû, ji bona hemû kes û derdorên aşitî xwez bû û gelek alî tîne li ser ziman dibêjin ku raste em ne PKK'ê ne, lê em jî hêvîdarê aşitî û demoqrasiyê ne. Ji ber wê ev bangê ji bona xwe weke ferman dibînin. Ev aliyên erenî ne, lê di heman demê de jî sazî û rayedarên dewleta Tirk bi şêwazekî ne fermî be jî hewildan bikin ku wê pêvajoyê vala derbixînin. Bi riya dezgehên xwe yên şerên taybet de ev tişt kirine û dê berdewam jî bikin. Divê civak û gelê me baldarbin û pir hişyar nêzî vê pêvajoyê bibin. Dewleta Tirk di her alî de tengav bû û neçar ma biçin li gel Rêber Apo hevdîtina bikin û ji bona ku ev tengasiya wan li raya giştî de neyê xuyakirin dê hewildanên curbêcur bikin. Di rastî de jî, banga hat kirin banga serkeftina şoreşa Kurdistanê ye. Têkoşîna aşitîya ne, li şerê çekdarî zehmetir e. Aştî û çareserî anîna herêmê jî pisportî û ezmûnekê mezin dixwaz ê. Rêxistin û kesayatên ku xwe ne ji bawer bi nikare pêngavekî wisa bavêjin. Bi banga xwe de jî Rêber Apo anî bû li ser ziman "gotibû ez xwe bawerim û çi bê xwestin jî ez ê bikim" ev gotin nîşaneya xwe bawerî û wêrekîyê ye.

**-Gelek aliyên Kurd, Tirk her wiha derdorên cuda piştgriya xwe ji bo peyamê eşkere kirin. Li gorî ev pêvajo bimeşe, astengiyên ku derdikevin çi ne?**

Astengiyên herî mezin di navbera rayedar û hikûmeta dewleta Tirk da, ya ku ciddî nêz nebûna pêvajoyê ye. Gelo dê dewleta Tirk bikare mafên gelê Kurd yên bingehîn pêk bîne? Tevgera Azadiya Kurdistanê hemû beşê xwe re ragihand ku amade be û ev pêvajoya Rêber Apo jêre pêşengtî dike piştgriya xwe dan dîyarkirin. Taybet ev 40 salin dawî ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve, şofînîzmekî tûnd hat pêşxistin. Netewperestiya ku pêkhate û gelên ku Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê de jiyan dikin nedîtî we dihatin. Ji ber wê pergalê jî dengê cuda cuda piştî peyama Rêber Apo di nav hikûmeta Tirk de derdikevin. Em vê dîsa dubare dikin û pir caran jî hatiye li ser ziman ger ku dewleta Tirk rast nêzî vê pêvajoyê nebe, dê rastî qeyrana bê û têk biçe. Dewleta Tirk ev salên dawî de jî, destwerdanê karê Sûriyê û hîn welatên din jî dike. Ev nahêlin ku em gelên Sûriyê pirsgirêkên xwe bi Sûrî-Sûrî çareser bikin. Ji bona çareserî û demoqrasî bê Rojhilata Navîn pêwîste dewleta Tirk dest ji vê siyaseta xwe ya dagirkeriyê berde. Bi rastî jî  derketina PKK û Tevgera Azadî têkoşîna hebûn û tinebûna gelê Kurd bû. Ev 50 salin jî ev têkoşîn bê navber berdewam dike û ev peyam çarenûsa gelê Kurd dide diyar kirin. Ne tenê banga çekdanîne an dest tekoşînê berdane, berovajî wê tekoşîn xurtkirin û derbasî pêvajoya danûstandinên çareseriyê bûyin e. Ezmûnên ku dîrokê de jî tê xuyakirin ev jî yêkalî nabe pêwîste aliyê hikûmetê û peywendîdarên din jî cidî nêz bibin. Ev derfet ava bûye û em gehiştine kêliyên dîrokî û pêwîste dewleta Tirk êrîşên xwe yên li ser herêmê bide sekinandin, guh bide banga agirbesta Tevgera Azadiyê. Li ser wê kelecanê em silav û nameya ku ji bona gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêşwazî dikin û piştgrî didin ev pêvajoyê.

# Divê zimanê çapemeniya Tirkiyê li gorî pêvajoya Aştî û Demokrasiyê be

Rojnamevan Mansur Adali da zanîn ku çapemenî û tavahî Tirkiyê divê li hember pêvajoya Aştî û Demokrasiyê zimanê xwe bidin guhartin û got: “Ger Tirkiyê di vê pêvajoyê de xwe nede guhartin, wê windahiyên mezin jiyan bike”.

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Piştî banga Rêber Abdullah Ocalan a Aştî û Demokrasiyê çapemeniya Tirkiyê hê jî îfadeyên ne li gorî bangê bikar tîne. Zmanê heyî nehatiye rastkirin û li gorî herikîna pêvajoyê nayê bikaranîn. Têkildarî vê mijarê Rojnamevan Mansûr Adali bersiva pirsên rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha ye:



**Piştî banga Rêber Abdullah Ocalan a Aştî û Demokrasiyê, çima zimanê çapemeniya nêzî hikumetê û derdorên wê nehatiye guhartin û hê jî vê bangê li gorî zimanê teslîmiyetê şîrove dikin?**

Piştî salên dirêj ji siyaseta tecrîda ku li ser Rêber Apo hatibû fezkirin, li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê banga dîrokî a Rêber Apo çêbû. Ev bang çawa pêşket, divê em bizanibin. Di bingeh de ev bang li ser daxwaza Tirkiyê û rayedarên dewletê pêşket. Li ser wê esasê jî Rêber Apo însiyatîfa xwe bikar anî û di 27’ê Sibatê de derket beramberî tavahî cîhanê, bi serenavê Banga Aştî û Demokrasiyê peyam da.

Dîroka Kurd û Tirkan ne niha û ne bi Komara Tirkiyê re dest pê kiriye. Her du jî xwe disipêrin salên dûr û dirêj, di gelek serdemên kirêtîk de ku qedera van gelan diyar dike de, hevgirtinek di navbera her du gelan de hatine kirin. Ji şerê Malazgirtê bigire û heyanî beriya avakriina komara Tirkiyê. Bi avakirina komara Tirkiyê re pêvajoya qirkirin û tunekirina gelê kurd hat destpêkirin û siyaseta îmhayê ji wê demê ve didome. PKK jî li hember vê siyasetê derket holê. Çima wê gelek, netewek, civakek bi qirkirinê re rûbirû bimîne. Helbet zimanê Tirkiyê di hemû qadan de li ser wê siyasetê hate avakirin. Li ser esasê dijbertiya gelê Kurd ne ziman, ne hebûn, ne çand bi tu awayî xwebûna gelê Kurd neyê qebûlkirin.

Derketina Tevgera Azadiyê jî weke bertekekê li dijî wan nêzîkatiyan bû. Li ser esasê ku di serdemên kirêtîk de çawa biratiyek di navbera herduyan de hebû û pêşengî kirin, di armacên PKK de ev yek hebû. PKK li ser wê esasî hate avakirin, li dijî Înkarkirin, tunebûn û neheqiyê derket, li dijî tunekirinê parastin hilbijart, li dijî koletiyê xeta azadiyê esas girt û têkoşîn meşand.

Di roja me îro de jî banga Rêber Apo weke xeleka dawî ya biserxistina wan armanca ye. Ev merheleya heyî ji bo herduyan jî pêvajoyekî dîrokî ye. Eger pêvajoya me ya niha jî di diyarkirina qedera gelan de ji bo ewlehî û hevgirtina herdu gelan be, careke di pêdivî bi hevgirtineke demokratîk û aşîtyan e heye. Li ser van bingehan divê zimanê vê pêvajoyê jî li gorî wê yekê were bikaranîn. Rûxmî ku bang ji dewletê hat û li ser wê esasê Rêber Apo însiyatîf bikatanî, lê tu guhartin di zimanê dewletê de nehatiye dîtin. Her tim weke teror nîşandan berdewam dikin. Bi kurtasî hê jî hebûna gelê Kurd di Tirkiyê de qebûlnekirin e.

**Ji bo biserxistina vê pêngavê, divê zimanê çapemeniya desthilatdar çawa tev bigere?**

Belê; em baş dizanin ku di civaka demokratîk û di qada siysî a demokratîk de, hemû ol, bawerî, etnîkî, netew, nasname û çand dikarin bi hev re jiyan bikin û rêxistina xwe ya demokratîk ava bikin. Rêber Apo ji bo vê mijarê di destnivîsa bangawaziya xwe de, paregrafek bi taybet ji bo vê yekê veqetandibû dibêje “Lazima zimanê serdema civaka aştî û demokrasiyê jî li gorî heqîqeta avakirina civaka Aştî û demokrasiyê bê avakirin”. Ev zimanê ku Rêber Apo jî eşkerekiriye niha di raye giştî de tê nîqaşkirin.

Çapemeniya Tirkiyê ger bi rastî piştgirî û hevgirtina her du gelan ji bo destpêkirina pêvajoyeke nû dike, divê ew jî xwe li gorî wê saz bike û xwe biguhere. Lê heya niha jî weke me gotibû jî nehatiye guhartin. Helbet sedemên vê yekê jî hene. Zimanê çapemeniya Tirkiyê, li gorî belgeyên ku hatine pêşiya wan yên ku her tim heqîqet berûvajî kirine û derewên xwe bawerkirine hatiye sazkirin. Ev yek ezberkirin û xwendin, derewên ku ji xwe re avakirine û rastiyên hetine serûbinkirin bawer kirine.

Rastiya civakî û dîrokî ya li Bakurê Kurdistanê ne wiha ye. Her çendî xwestine gelê Kurd tev ziman û çanda wî weke ku tunene bihesibînin, lê ev yek pêk nehat. Bi hemû şêwazên qetlîaman jî nikarîn vê heqîqetê rakin. Dewleta Tirkiyê di vî zimanî de îsrarkirin wê ne tenê gelan bide windakirin, wê hebûna Komara Tirkiyê bi xwe jî bixe xeteriyê û perçe bike. Lazime Dewleta Tirkiyê vê derfetê bidest bixe û li gorî wê zimanê rastiya heyî îfade û nûjen bike. Bi çavekî ku êdî Kurd perçeyekî ji vê heqîqetê ne wê rayedarên Tirk û çapemenî li xwe vegere, ew tewriyên ku PKK teror e û dijmine divê ji holê bên rakirin. Daha zêdetir divê li hember komkûjî, kiryar û qetlîamên di heqê gelê Kurd de kirine rexnedayîn bidin û xwe bidin efu kirin. PKK ji vê yekê re vekiriye, berê jî Rêber Apo di pêvajoya derbasbûyî de got bila komîteyek lêpirsînê bê avakirin û ceza çi be, em ê bidin. Lê li hember kiryarên dîrokî yên dewletê ev weke nûqteyekê ye. Lê rûxmî wê jî qet rayedarên Tirkiyê behsa van tiştan jî nakin.

Zimanê çêker a li gor pêvajoya Aştî û Demokrasiyê divê bi qebûlkirina heqîqet û rastiya gelê Kurd be.

**Ji bo pêkanîna zextekê li ser çapemeniya desthilatdar erka li ser Çapemeniya Azad çi ye û ew çawa dikare ji banga Rêber Apo re bibe bersiv?**

Çapemeniya Azad divê heqîqeta heyî bi awayekî dewlemend û têrker ji Raye Giştî û gelan re re ragihîn. Mînak sedema van şerên durûdirêj çi bûn. Bedelên çiqas mezin hatin dayîn. Sedemên jiyankirina pêvajoyên berê divê werin çîrove kirin. Careke din dewlemendiya çandî, civakî, olî û etnîkî ya herêmê bi Raye Giştî re baştir bê parvekirin. Zimanê vê serdemê ji rayedar û çapemeniya Tirk a dagirker ku bi temamî veguheriye şerekî taybet, lazime Çapemeniya Azad li bend û hêviya wan nemîne ku guhartinekê di xwe de avabikin. Divê siyasetekî weşanê wiha avabike ku hemû argomanên wan yên li ser berûvajîkirina heqîqetê, qirkirin û îmhayê hatine avakirin; pûç û vala derbixîne. Her wiha derbarê pêvajoya Aştî û Demokrasiyê bi awayekî baş bi ferqa di navbera zihniyeta demokrasiyê û hişmendiya desthilatdariyê, eşkere û şênber parvebike. Eger Çapemeniya Azad di van mijaran de xebatekî giran bimeşîne, ew dem dikare zextê li ser çapemeniya desthilatdariyê û Tirkiyê bike û argomanên destê wan de pûç bike. Bi vê yekê re em dikarin ji banga Rêbertî û pêvajoyê re bibin bersiv.

# ‘Welatiyên Efrînê bendewarên vegera cih û warê xwe ne’

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Rêveberê Meclisa Giştî ya Kombenda Efrîn a Civakî, Ibrahîm Heftaro anî ziman ku gelê Efrînê bi peymana QSD’ê û Şamê şadwer in û got: “Da ku vegereke bi ewle pêk were divê welatiyên Efrîn ê di zindanên dagirkeriya Tirk de azad bibin, komên çete û dagirkerî ji axa Efrînê derkevin.”**



Peymana ku di navbera QSD’ê û desthilata Şamê de hate îmzekirin bû cihê kêfxweşiya piraniya aliyên Sûrî weke gaveke destpêkê ji pêkanîna diyaloga sûrî-sûrî re, hem jî ji bo çareserkirina pirsgirêkan. Yek ji van pirsgirêkan, dosiya herêmên dagirkirî weke Efrîn, Serêkaniyê û Girê Sipî, pê re jî vegera penaberan li cih û warên wan.

Derbarê mijarê de rêveberê Meclisa Giştî ya Kombenda Efrîn a Civakî, Ibrahîm Heftaro ji rojnameya me re axivî.

**‘Gelê Efrînê bi peymanê şadwer in’**

Heftaro da zanîn ku gelê Efrînê bi peymana QSD’ê û Şamê şadwer in û wiha got: “Em ji peymana ku di navbera fermandarê Giştî yê QSD’ê Mezlûm Ebdî û serokê desthilata Şamê Ebû Mihemed Elcolanî de îmze bû, pir kêfxweş in. Ev peyman bû bingehek ku çawa gelên Sûriyê bi hev re li ser esasê wekhevî, nenavendî, pirrengî û aştiyê bijîn. Herwiha weke gelê kurd maf û nasnameya xwe di destûrê Sûriyaya siberojê de dibînin. Lê ev peyman bi taybet ji bo gelê Efrînê û hemû gelên din ê herêmên dagirkirî cihê şadweriyê bû û em xwe tê de dibînin ku çawa vegerin cih û warê xwe û li ser xaka xwe bi aramî bijîn. Vê peymanê hêviyeke mezin da me tevan. Dema ku Cenêral Mezlûm Ebdî peymanek wiha îmze kiribe helbet em pê re ne û em ji cenêralê xwe bi bawer in.”

**‘Gelê Efrînê bendewarên vegera cih û warê xwe ne’**

Ibrahîm Heftaro destnîşan kir ku welatiyên Efrînê bendewarên vegera warê xwe ne û wiha domand: “Piştî ketina rêjîmê, da ku gelên Efrînê vegerin bajarê xwe, xwepêşand li Qamişlo li dar xistin. Gelên Efrînê yên ku li kantona Cizîrê bi cih bûne bi girseyî meşek li Qamişloyê li dar xistin. Herwiha me li pêşiya Navenda Netewên Yekbûyî mîtîngek li dar xist. Gel daxwaza vegerek bi rûmet li warê xwe kir, hem jî efrîniyan bang li hemû saziyên navnetewî, desthilata Şamê û Rêveberiya Xweser kir. Ji wê rojê ve Rêveberiya Xweser kete tevgerê, berî peyman bê îmzekirin hevseroka Desteya Têkiliyên Derva Ilham Ehmed civînek bi me re li dar xist. Ilham Ehmed ji me re diyar kir ku ji bo vegera penaberan û derxistina çeteyan xebat tên kirin û wê di demeke nêz de hemû penaber vegerin warê xwe Piştî ku peyman hat îmzekirin êdî sebr û hedana gelê Efrînê ji bo vegera li cih û warê wan nemaye. Îroj gelê Efrînê ne ku rojan dihejmêrin, ew seet û kêliyan dijmêrin ku kengî vegerin warê xwe yê resen. Hêviya me ew e ku di piratîkê de xalên peymanê pêk werin û gavên bi lez li ser rûyê erdê bên avêtin da ku em vegerin Efrînê.”

**‘Hîna li ser rûyê erdê xalên peymanê pêk nehatine’**

Ibrahîm diyar kir ku xalên peymanê li ser rûyê erdê ji bo vegera efrîniyan pêk nehatine û wiha bi lêv kir: “Îro piraniya welatiyên Efrînê dûrî warê xwe li gelek deverên Rêveberiya Xweser dijîn, derfetên penaberên Efrînê kêm in û rêxistinên mirovî yên cîhanî jî destekê nadin wan, tenê rêxistinên xwecihî piştgiriyê dikin. Ev piştgirî têrê nake, piştî îmzekirina peymana di navbera QSD’ê û desthilata Şamê re îro penaber li benda vegerê ne. Lê hîna li ser rûyê erdê tu gavên ji bo pêkanîna xalên wê hevpeymanê li ser rûyê erdê têkildarî vegera efrîniyan nehatine evêtin.”

**‘Divê girtî azad bin, komên çete û dagirkerî derkevin’**

Rêveberê Meclisa Giştî ya Kombenda Efrîn a Civakî, Ibrahîm Heftaro anî ziman ku divê welatiyên Efrîn ê di zindanên dagirkeriya Tirk de azad bibin, komên çete û dagirkerî ji axa Efrînê derkevin û wiha axivî: “Piştî îmzekirina peymanê daxwazên gelê Efrînê ew in ku komên çete û dagirkeriya Tirk ji Efrînê derkevin, ji ber ku derketina dagirkeriyê mercekî sereke ye ji bo vegereke bi rûmet û ewle. Daxwaza din ew e ku Hêzên me yên Rizgarkirina Efrînê bi me re vegerin Efrînê, ev yek jî ji bo welatiyên Efrînê parastina xwe bikin. Di heman demê de pêwîst e sûcdarên binpêkirinan di dadgehên navnetewî de bên cezakirin.”



# Komkujiya Helebce; xaleke reş li ser eniya mirovahiyê ye

Beriya 37 salan, dijminên gelê kurd bi çekên kîmiyayî li pêş çavê cihanî li bajarê Helebce yê Başûrê Kurdistanê 5 hezar kes qetil kirin. Li hemberî vê komkujiyê weke her car cîhan bêdeng ma. Lê her cîhan çend kerr û lal be jî, êdî gelê kurd ê azadîxwaz nahêl in Helebceyeke din rû bide.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Deme ku mirov li dîroka gelê kurd dimeyzîne, êşeke mezin û komkujiyên ku nayên bawerkirin li ser gelê kurd pêk hatine, dibîne. Yek ji wan rojên bi êş û di bîra her kesî de mayînde ye komkujiya Helepce. Berî 37 salan rejîma Baas a Iraqî, li bajarê Helebceyê yê Başûrê Kurdistanê komkujiyeke pêk anî. Tê de bi yek carê 5 hazar kes hatin qetilkirin û bi hezaran birîndar bûn. Helepce weke deqeke reş li ser eniya mirovahiyê ye. Xwedî çîrokeke dûr û dirêj e. Di 16’ê Adara 1988’an balafirên şer yên artêşa Îraqê bombeyên kîmyawî barandin ser Helebceyê. Kurd bu qurban şerê di navbera Îran û Iraqê de. Bi yek carê 5 hezar kurd bi xaza xerdal a kîmyewî hatin qetilkirin. Bi 10 hezaran Kurd jî seqet man. Dema ku dem derbasbû êdî qîr û qêjîn di nav hev de bilind bûn û li erşê xwedê sekinîn. Bandora bombeyên kîmyewî tenê bi mirina pênc hezar Kurdan û bi deh hezaran seqet mayîn ve bi sînor nema. Bandora bombeyên kîmyawî hê jî li bajêr didome. Bi hezaran kesan jî çavên xwe wendakirin. Li hemberî vê komkujiyê weke her car cîhan bêdeng ma. Lê her cîhan çend kerr û lal be jî, êdî gelê kurd ê azadîxwaz nahêl in Helebceyeke din rû bide.

**Komkujiya Helece; Birîn vebû, lê hîn jî derman nebûye**

Li gorî daneyên Neteweyên Yekbûyî, ji bo bombeyên kimyawî li Helebce û derdora wê di navbera salên 1991 û 1994’an de nexweşiya penceşêrê ji sedî 800 zêde dibû. Herwiha ji ber bombeyên kîmyawî nexweşiyên jinan çar qat zêde bûn û bi hezaran kes ji bi nexweşiyên qiriq, kezeb, poz û çavan ve rû bi rû man. Bi hezaran kesan jî çavên xwe wenda kirin. Li gorî agahiyan, hê jî bandora bombeyên kîmyawî, zarokên nû tên cîhanê tehdîd dike.

Ji berpirsyarên sereke yên komkujiya herî bi xwîn a diroka nêz Sedam Huseyn û Elî Hesen Ebdulmecidê bi navê kodê “Eliyê Kimyawî” bûn. Herdu hatine girtin hikûmeta Îraqê cezayê darvekirinê liser wan sepand. Sedam Huseyn di 30’ê Kanûna Biçûk a 2006’an de hat bidarvekirin û Eliyê Kimyawî ji di 25’ê Kanûna Mezin a 2010’an de hat darvekirin.



**Helebce di dîrokê de rastî gelek wêrankariyên xedar hatiye**

Navçeya Helebce ya ji 1599 km. çargoşe rûberan pêk tê. 75 km. dikeve Başûrê Rojhilatê Silêmaniyê. Di dîrokê de Helebce gelek caran rastî wêrankariyên xedar hatiye. Cara dawî 1650’yan bajar jinûve tê avakirin û 1889’an dibe navçe. Helebce ji navenda wê û bajarokê Sîrwan, Xurmal û Biyare pêk tê.

Li Helebce cara yekê dewletekê di nava sînorên xwe de çekên kîmyawî berdan!

16’ê Adara 1988’an 20 balafirên şer yên MIG-23, yên rejima Iraqê çekên kîmyawî bi ser Helebce de barandin. Cara yekê bû ku dewletekê di nava sînorên xwe de çekên kîmyayî dibarandin. Artêşa Iraqê 2 rojan berî çekên kîmyabaranê, derdora Helebce dabû ber roket û hawanan. Bombe bi giranî bi ser navenda navçeyê de dihatin barandin. Ji bo ku ti kes nikaribe derkeve, rêyên ketin û derketinê dihatin bombebarankirin.

**Komkujiya Helebce plana bi destê neyarê gelê kurd pêk hat**

Di serî de ev yek di navbera Tirkiyê, Îran û Îraqê de hatibû plankirin. Wê çawa bikin û çawa hewl bidin hatibû axiftin. Deme ku heta 16’ê Adara di sala 1988’an de êdî hêzên Îraqê dest bi qetilkirina kurdan kir. Bi çekên kîmyewî ji aliyê hêzên Îraqê hatin bi kar anîn. Ev çêkên ku bi kar anîn jî, ji Hollanda hatibûn Îraqê. Alamanyayê jî heya wê kêlîkê hinek çekên tiransferî Îraqê kiribûn.

**Asîmanê Helebce şahidiya babîsoka ku li rûyê erdê pêk hatibû, kir**

Gazên jehrê yên di komkujiyê de hatin bikaranîn; Sarîn, Tabon û Xerdel (VX) bûn ku bandora wan li mejî, hundir, bêhindan û çerman dikir. Zêdetirî 20 balafirên şer ji du aliyan ve bajarê Helebce bomberan kirin. Piştî bombebaranê ewreke reş, spî û zer wekî bablîsokê bi qasî 50 metrî bilind bû û bêhna gazê ya weke bêhna sîran ji hewayê hat.

**Heya roja îro li Helebce zarok dibin qurbanên siyasetan**

Di dema bomberana çekên kîmyayî de, li cem şêniyên Helebce derbarê xweparastina ji gazên jehrî de ti agahî nebûn. Herwiha amûrên tenduristiyê jî li ber destê wan nebûn. Li gorî amarên li ber dest, berî komkujiyê 70`ê hezar kes li navçeyê dijiyan. Ti kesî nikariya amarên vê komkujiyê bi temamî eşkere û zelal bike. Lê gorî amarên hatin bidestxistin zêdetirî 5 hezar kes şehîd bûne. Li gorî amarên wê demê, ji sedî 75 ji qurbanan jin û zarok bûne. Herwiha zêdetirî 10 hezar kes jî birîndar bûn. Piraniya birîndaran jî piştre ji ber nexweşiya mejî, derûnî, bêhndan, ketina çerm û nexweşiyên cuda şehîd bûne. Heta niha jî bandora wan gazan li ser nifşên nû dewam dike. Hê jî gelek zarok astengdar ji dayîk dibin.

**Di qada navneteweyî de naskirin û erêkirina komkujîye Helebce**

Di qada navneteweyî de naskirin û erêkirina wê pir girîng e. Ku bû, komkujî û jenosîdên nû yên ku wê li ser serê kurdan bibin wê bigirê. Wê li Tirkiyê, Îran û li Sûriyê ji pêşiya komkujiyên nû bigirê. Li Tirkî, Îran û Sûriyê hê jî pirsgirêka kurd ne hatiya çareserkirin, ev jî, heya ku deriyê komkujiyên nû veke ku çareserkirin nebe, bêguman wê veke jî. Ji bo pêşya wan komkujiyên ku di paşarojê de bibine bê girtin, di qada neneteweyî de û di BM de û di neteweyên yekbûyî de bê naskirin.

**Erdogan dîroka Sedam dûbare dike**

Welatên biyanî, rêxistin û civakên navneteweyî li hemberî vê qirkirinê, bêdengî hilbijartin û ti piştgirî jî nedan gel. Lê hin rêxistinên siyasî û civakî yên Kurdistanê, Kurdistaniyên li derveyî welat, bi xebat û çalakiyên xwe raya giştî ya cihanê ji vê qirkirinê agahdar kirin. Sala 2003’yan piştî Iraq ji aliyê Amerîka ve hat dagîrkirin yek ji sûcên sereke ku rêjîm û serokê wê Sedam pê dihatin sûcdarkirin, Jenosîda Helebce berdewama Enfalê bû. Wek jenosîd nasîna komkujiya Helebce û Enfalê di qada navneteweyî de, ji bo gelê Kurdistanê girîng e. Dewleta Tirk a dagirger di roja îro de jî, li ber çavê cîhanê dîroka Sedam dûbare dike û li dijî gel û gerîla çekê kimyawî bi kar tîne.

Dagirkeriya Tirk jî bi dehê salan e komkujiyên mîna ya Helepce dike. Ji sala 1986 haya 1999’an, ser 60 hezarî re kurd kuştine û ser 40 hezar kurdî re jî hatine windakirin. Herwiha nêzîkî 20 hezarî nivîskar û rojnemavan û mirovên navdar yên kurd hatina kuştin û windakirin. Dewleta Tirk di dagirkirina Efrîn û Serêkaniyê de gaza kimyayî bi kar anî ku ev hat teqezkirin, lê dîsa dewletên cîhanê bêdeng man.

**FENER**



## Li Sûriyê Kopyakî Tirkiyê Tê Avakirin!

**Idrîs Henan**

Piştî hilweşîna rejîma Baas li Şamê ku çend meh di ser şahî û geşbîniyên gelên Sûriyê yên li dijî zilm û zordariya rejîma ketî serî hilada bûn re derbas nebibûn, rûbirûyî komkujî û kiryarên desthilatdariya nû ya Şamê man û bi sosretî gavên wê yên dişibîn rejîma berê temaşe dikirin. Îroj jî, piştî çend roj di ser vekirina pencereya hêviyê li Sûriyê ku bi îmzekirina peymana dîrokî ya di navbera Fermandarê Giştî yê QSD Mazlûm Ebdî û serokê qonaxa demkî li Sûriyê El Şar`i - Al Colanî-de derbas dibin, desthilata Şamê “Reşnivîsa Destûrî” ku tê de bendên kevneşopî, şêwaz û pîvanên Baasê tîne bîra mirovan, erê dike.

Diyare desthilata Şamê bi rijde ku heqîqeta Sûriyê û pirengiya wê înkar bike û bi zanebûn nasnameya wê ya civakî û neteweyî berovajî bike ku tişta bi navê “Beyanameya Destûrî” hîç temsîla giyan û nasnameya niştimanî ya pêkhateyên Sûriyê yên Ereb, Kurd, Suryan, Asûr, Ermen,… hwd nake. Ji lew re, Rêveberiya Xweser wê yekê red dike û tekezî li hevgirtin û yekîtiya pêkhateyên Sûriyê dike ku bi hev re pêşeroja demokratîk ava bikin.

Xuyaye desthilata Şamê naxwaze sûdê ji derfeta ku peymana dîrokî ya bi QSD re îmze kiriye werbigire û hewl dide li dorê bizivire û bi pîvanên derniştimanî tekezî li zihniyeta takekes a ku gelên Sûriyê li dijî wê rabûne, dike. Mirov bi vê yekê re carek din fêm dike ku gotin û pratîka desthilata Şamê hev û din nagirin û li gorî elmandinên dagirkeriya Tirk tevdigere. Ango bi şêwra wê radibe û rûdine ku dagirkerî jî dixwaze kopyakê ji sîstema xwe li Sûriyê ava bike û tevayî Sûriyê bike eyaletek Tirkiyê. Lew re, gelên Sûriyê gavên vê rejîma nû biyaniyê xwe dibînin ku dûrî çanda welêt in û ti carî mirov nikare li gorî bendewariya gel û nasnameya wî ya resen binirxîne. Berovajî wê yekê, li dijî vîna gel û têkoşîna wî ya azadî û demokrasiyê ne.

Divê Dîmeşq têbigihêje ku çi biryar û pratîka dûrî nirxên gelên Sûriyê û çanda wî ya resen bin, ti şansê wan ê jiyanê nabe û nikarin domdar û li gorî hêviyên nifşên pêşeroja wê bin. Israra di vê zihniyetê de, bi cil û bergên nû, ji nû ve vejandina rejîma Baasê ye. Ango; despotiyeke nû bi rêbazên klasîk ên sîstemên faşîst ên weke AKP, Baas û Ixwan Almislimîn afirandine. Ev jî ji ber şaşnihêrandin, şaşxwendin û xwespartina hêzên derve ye.

Komkujiyên li Beravê rûdane û hîna jî di dewrê de ne, ji ber vê zihniyeta me li jor qalê kiriye ne. nêzîkatiyên berjewendîperest, desthilatperest û despotîk ku qedera welatekî dispêrin çanda biyanî ya Tirkiyê, rê li ber hezaran çeteyên Îgorên Tirkistanê, Ozbek, Şîşan, Tajîk, Dagistan, Elban, Ereb û Tirk vekir ku li Sûriyê komkujiyan pêk bînin.

Bi qasî ku peymana bi Şamê re hatiye îmzekirin dîrokî ye, bi qasî wê jî divê, ji vir û pê ve, mirov bi şik û guman li pabendiya Şamê binêre. Mîrateya desthilatdariya Baas û pratîka El Şer`i wî mafî dide gelan ku gerantiya parastina hebûna xwe misoger bikin. Ji ber vê jî, erêkirina desthilata Şamê ji “Reşnivîsa Destûrî” ku welêt li gorî yek netew, yek ziman, yek al û yek olê dîzayin dike, tê wateya xapandin û bertereفkirina pêkhateyên Sûriyê yên dîtir e. Di heman demê de, dûrketina ji nirxên azadî, demokrasî, edalet, wekhevî û di rêbazên qirkirin û komkujiyan de îsrarkirin e.

Eger Şam rêbazên xwe neguhere û dest ji xapandin û berovajîkirina rastiyan bernede, li gorî talîmat û berjewendiya dagirkerên axa Sûriyê tevbigere û di ya xwe de rijd be, wê çarenûsa Baas para wê be.